# Vînwar

ji rengên xemên xerîbîyê xemgîn
ji mêhra te ye evro û siba rengîn

Dil damay, ji eşqa te çav digirîn
Meya lêvên te ye, lêvên bigirnijîn

Dilê derya hîvîyên min sîm û xak
Hestên te ne azadîya ahên pak

Esîra deryayeka bê merg û tak
Pêlên vîna te ne halî dikin çak

Di nava peyvên azirî di mînî gulzar
Şîrîn peyva li ser lêva bo dilê bêzar

Di kuratîya hestên tejî xem vînwar
Derbider û penaber, bêkes û bêwar

Diltenga warê vînê, Duhok û Efrînê
Aramgeha dil, li zozan û feraşînê

# ڤینوار

ژرەنگێن خەمێن غەریبییێ خەمگین
ژ مێهرا تەیە ئەڤرو و سبا رەنگین

دڵ داما‌ی، ژ ئەشقا تە چاڤ دگرین
مەیا لێڤێن تە یە، لێڤێن بگرنژین

دڵێ دەریا هیڤییێن من سیم و خاك
هەستێن تە نە ئازادیا ئاهێن پاك

ئەسیرا دەریایەکا بێ مەرگ و تاك
پێلێن ڤینا تە نە حالی دکەن چاك

د ناڤا پەیڤێن ئازری د مینی گولزار
شیرین پەیڤا لسەر لێڤا بۆ دلێ بێزار

د کووراتییا هەستێن تژی خەم، ڤینوار
دەربدەر و پەنابەر، بێ کەس و بێوار

دڵتەنگا وارێ ڤینێ دهۆك و ئەفرینێ
ئارامگەها دڵ ل زۆزان و فەراشینێ

| | |
|---|---|
| Hîvyeka baranî bû li her êvarekê<br><br>Min ji xew radikir li her sipêdeyekê | هیڤیـەکا بارانی بوو ل هەر ئیڤارەکێ<br><br>من ژ خەو را دکر ل هەر سپێدەیەکێ |
| **** | **** |
| Helbesta Vînwar, dikeme dîyarî bo Mamostayê hêja Mustefa Reşîd, ji bo kar û xebat û her harîkarîyeka ku cinabê wî di maweyê van du salên bûrî da bi dilekê Kurdewarî û şiroveyên di warê rêzimana zimanê Kurdî da li gel min harîkar bûye.<br>Daxwaza serkeftin û saleka pirî xweşî bo bêrêz Mustefa Reşîd, Navenda Pena Kurd û tevaya miletê kud dikem. | هەلبەستا ڤینوار، دکەمە دیاری بۆ مامۆستایێ هێژا موستەفا رەشید، ژ بۆ کار و خەبات و هەر هاریکاریا کو جنابێ وی د ماوەیێ ڤان دوو سالێن بووری دا ب دلەکێ کوردەواری و شرۆڤەیێن د وارێ رێزمانا زمانێ کوردی دا ل گەل من هاریکار بوویە.<br>داخوازا سەرکەفتنێ و سالەکا پری خۆشی بۆ بەرێز موستەفا رەشید ، ناڤەندا پەنا کورد و تەڤایا ملەتێ کورد دکەم. |
| Dayka Kurd | دەیکا کورد |